

Image source: Freepik | 2019

SLDP

Syrian Legal Development Programme

SCM

Navenda Sûriyeyî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê

Syrian Center for Media and Freedom of Expression

# Mîkanîzma Navdewletî ya Serbixwe û Bêalî ji bo alîkarîya

lêpirsîn û dozvekirina li kesên berpirs di ber tawanan de li gor qanûna navdewletî li Sûrîyayê ji 2011an ve

# Pêşniyarnameyk ji Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê û Programa Sûrîyayî ya Bipêşxistina Qanûnî bo rêxisyinên civaka sivîl a Sûrîyayî yên ku di civînên Lozan4ê de beşdar in bi rêya Grûpa Hevrêzkarîya Dadmendîya Veguhêz.

Armanca vê kaxezê alîkarîya Rêxistinên Sûrîyayî ye bo fêmkirina mêkanîzma hilbijartina dozan û destnîşankirina pêşikîyên dadgehên navdewletî yên cûrbecûr e di dema darizandina tawankerên cengê de di çarçoveya nakokîyên navdewletî û yên nenavdewletî de ye û qezencgirtina ji wan di warê tawanên navdewletî yên metirsîdar de di nava şerê çekdarî yê li Komara Erebî ya Sûrîyayî de.

Ev ne cara pêşîn e ku civaka navdewletî rastî tawanên metirsîdar mîna yên ku li Sûrîyayê çêdibin tê û Dadgehên navdewletî yên cûrbecûr mîna (Dadgeha Tawanêên Navdewletên Dadgeha Tawanên Navdewletî ya Yugoslaviaya berê û Dadgeha Tawanên Navdewletî ya Rawendayê) ji bo darizandina tawankerên tawanên navdewletî hatibûn çêkirin.

lê ne pêkan e ku dadgehek hemû tawanên navdewletî yên ku ji sala 2011an ve li Sûrîyayê hatine kirin bigire dest , dibe ku tenêên hin tawanan bigire dest ji ber kêmbûna jêderên heyberî an ji ber sedemên din.

Tevî ku hemû dozên ku navên tawanên navdewletî li wan tê kirin giring in, lê divabe hin doz berî hinên din vebin, pêdivîya hin dozan bi xebateke demlidest heye. ji lew re giring e ku hin prensîp û pîvanên bijartina dozan werin danîn.

her weha da ku xewnên mezin têk neçin û tometên bersivdayîna bo dexta siyasî neyên kirin, divabe pêvajoya helbijartina dozan xuya û zelal be.

Ev rûpel dê pîvanên Dadgehên Navdewletî yên ku pêvajoya bijartina dozan û destnîşankirina pêşikîya dozvekirinan destnîşan dike, şirove dike. armanca sereke a vê rûpelê şirovekirina pîvanên cûrbecûr e da ku rêxistinên Sûrîyayî karibin qewîtîyên ku xwe dispêrin qanûna tawanên

navdewletî pêşkêş bikin bo doz û tawanên ku rêxistinên Sûrîyayî dixwazin Mîkanîzma Navdewletî ya Bêalî û Serbixwe piştî berhevkirin û analîzekirina peytên girêdayî binpêkirinên mafên mirovan û destdirêjîyên der heqê mafên mirovan de li Sûrîyayê, li gel amadekirina dosyayên hêsankirina pêvajoyeke serbixwe bo tawanên navdewletî di şerê çekdarî de li Sûrîyayê.

tiştê ku em ê di vê pelê de şirove bikin li jêr serenavê (Dozvekirina Stratîcîk) an (Dozvekirina Çalak) tê ketegorîkirin ku vekirina dozan ji bo çêkirina guhertinên berfireh di nava civakê de li xwe digire. armanca bikaranîna (Dozvekirina Stratîcîk) ew e bikaranîna qanûnê ji bo peydakirina şûneke domdar ne tenê ji bo bidestxistina dozê. rewşên (Dozvekirina Stratîcîk ) balê dikişînin ser bandora dozan li ser civak û hikûmetan her weha giranîyê dide encama dozê.

gerek e têgîna (Dozvekirina Stratîcîk) berçav be di dema bijartina doz û tawanên ku rêxistinên Sûrîyayî dixwazin Mîkanîzma Navdewletî ya Bêalî û Serbixwe li ser wan were pêkanîn de, her weha dema berhevkirin, parastin û analîzekirina dosyayên girêdayî binpêkirinên qanûna navdewletî.

**Çar beşên vê pelê hene:**

**yek:** destnîşankirina çarçoveya karê Mîkanîzma Navdewletî ya Serbixwe û Bêalî.
**Du:** rêbaza ku ev pel li ser dimeşe ji bo destnîşankirina pîvanên hilbijartina dozan û pêşekîya dozvekirinê.
**Sê:** destnîşankirina pîvanên hilbijartina dozên tawanên cengê yên ku ji hêla Dadgehên Navdewletî yê cûrbecûr ve hatie bikaranîn ku dibe sûd ji wan were girtin di dema destnîşankirina dozên ku divabe Mîkanîzma Navdewletî ya Serbixwe û Bêalî balê bikişne ser dema çêkirina dosya û peytên tawanên ku Li Sûrîyayê çêbûne
**Çar:** şirovekirina naveroka van pîvanan û çawa dadgehên navdewletî sûd ji wan girtibû dema hilbijartina dozan û destnîşankirina pêşikîya dozvekirinan di tawanên navdewletî de.

Yek: divabe çarçoveya karê Mîkanîzma Navdewletî ya Serbixwe û Bêalî were destnîşankirin bo alîkarya di lêpirsîn û dozvekirina li kesên berpirs di ber tawanên cengê yên metirsîdar de li Sûrîyayê ji Adara 2011an ve berî ku pêşikîyên dozvekirina li tawanên navdewletî li Sûrîyayê werin destnîşankirin her weha gereke çarçoveya karê Mîkanîzma Navdewletî (IIIM) were destnîşankirin an (Çarçoveya Pisporîya) Mîkanîzma Navdewletî ya Bêalî û Serbixwe (IIIM).

## Biryara Komeleya giştî 71/248

"Komeleya Giştî balê dikişîne ser giringîya garantîkirina lêpirsînê der barê tawanên girêdayî binpêkirinên qanûna navdewletî de nemaze qanûna navdewletî ya mirovî û qanûna navdewletî ya mafên mirovan ku ji adara 2011an ve li Komara erebî ya Sûrîyayî hatine kirin û hin ji wan weke tawanên cengê an yên dijî mirovahîyê tên hesibandin.
Komeleya Giştî biryara çêkirina Mîkanîzma Navdewletî ya Serbixwe û Bêalî distîna bo alîkarîya di lêpirsîn û dozvekirina li kesên berpirs di ber tawanên metisîdar de li gor ketegorîkirina qanûna navdewletî û yên ku ji adara 2011an ve li Komara erebî ya Sûrîyayî tên kirin. her weha ji bo berhevkirina û analîzekirina peytên binpêkirinên qanûna navdewletî ya mirovî û binpêkirinên mafên mirovan li gel çêkirina dosyayan bo hêsankirina destpêka pêvajoya dadgehkirineke zelal û serbixwe li gor pîvanên qanûna navdewletî li dadgehên niştîmanî, herêmî an navdewletî.'

zimanê bikarhatî di biryara Komeleya Giştî ya ku Mîkanîzma Navdewletî ya Serbixwe û Bêalî (IIIM) damezrandîye diyar dike ku çarçoveya mîkanîzmê ne tenê girêdayî tawanên cengê û yên li dijî mirovahîyê ye lê hemû binpêkirinên qanûnên girêdayî (IIIM)ê yê navdewletî mirovî û qanûna navdewletî ya mafên mirovan li xwe digire (dibe ku binpêkirina qanûna navdewletî ya mirovî/ qanûna navdewletî ya mafên mirovan ne tawaneke cengê an dijî mirovahîyê be)

dadgeha tawanên navdewletî ya bi tenê ku îro roj xwedî serwerî ye li ser Sûrîyayê ew e Dadgeha Tawanên Navdewletî û ev dadgeh tenê dikare di warê tawanên cemgê, tawanên dijî mirovahîyê û yên qirkirinê heye li gor Sîstema Roma ya Sereke. û li gor qanûna navdewletî, dadgehên niştîmanî dikarin serwerîya dadgehî ya cîhanî bi kar bînun, di dema nuha de ew bingeha tek a ku dadgehên ne Sûrîyayî dikarin bi rêya wê kesên ne welatî yên ku tawanên cengê li Sûrîyayê kirine darizîne. lê tenê dema ku ev tawan weke "Tawanên Navdewletî 'li gor qanûna navdewletî werin ketegorîkirin mîna tawanên cengê, tawanên li dijî mirovahîyê û tawanên qirkirinê. ev lîste tawanên ku Sîstema "Roma ya sereke' ' behsa wan kiriye jî li xwe digire, li gel hejmareke din a tawanên cengê ku di Sîstema " Roma ya sereke' ' de nehatibin binavkirin. (li lîsteya tawanên cengê ya ku ji hêla Komîteya Navdewletî ya Xaça Sor derketiye binêre, nemaze yên girêdayî şêrên çekdarî yên ne navdewletî).

li gor vê yekê em dikarin bibêjin ku tenê di rewşekê de binpêkirinên qanûna navdewletî ya mirovî û ya mafên mirovan ku ne weke tawanên cengê tên hesibandin, dê bikevin çarçoveya karê Mîkanîzma Navdewletî ya Serbixwe û Bêalî de (ew e çêkirina dadgeheke tawanên navdewletî bo Sûrîyayê ku serwerîya wê li ser hemû kiryarên dijî qanûna navdewletî ya mirovî û qanûna navdewletî ya mafên mirovan hebe) ji lew re diyar e em bigihên encama ku karê Mîkanîzma Navdewletî ya Serbixwe û Bêalî dê di dema nuha de tenê girêdayî tawanên digihên asta tawanên vengê û yên dijî mirovahîyê an yên ku li gor qanûna navdewletî weke qirkirin tê ketegorîkirin.

## Du: rêbaza ku ev pel ji bo destnîşankirina pîvanên bijartina dozan û pêşikîya dozvekirinan dişopîne: Du: rêbaza ku ev pel ji bo destnîşankirina pîvanên bijartina dozan û pêşikîya dozvekirinan dişopîne:

vê pelê xwe spartiye pîvanên taybet yên bijartina dozan ku ji hêla Dadgeha Tawanên Navdewletî ve hatine danîn û di pela siyaseta xwe ya giştî de pêşkêş kiribû ku ji hêla dozgera giştî ve hatibû nivîsîn bi serenava "Pela Siyaseta Giştî ya Girêdayî Bijartina Dozan û Rêzkirina wan li Gor Pêşikîyê" û di îlona 2016an de hatibû belavkirin.

dadgehê pîvan li sê elementên sereke dabeş kiribû: metirsîya tawanê, rêjeya berpirsyarîtîya tawanbaran û tawanên wan. li jêr her beşekî ji van şîroveya wê û hin xalên din divabe ber çavan werin girtin. ji alîyekî din ve vê pelê xwe spartiye pirtûka "Pîvanên Destnîşankirina Pêşikîyan û Sozên Tawanên Navdewletî yên Sereke" ku ji hêla "Mortin Bergesmo" ve hatiye êdîtekirin. vê pirtûkê pîvanên Dadgeha Tawanên Navdewletî, Dadgeha Tawanên Navdewletî ya Yugoslaviaya berê, Dadgeha Tawanên Navdewletî ya Rawendayê, Dadgeha Elxemîr Elhumir û Dadgeha Sîralyonê ya bijartina dozan û destnîşankirina pêşikîyên dozvekirinan analîze kirine.

her weha pîvanên bijartina dozên tawanên cengê û yên li dijî mirovahîyê û dozên binpêkirina mafên mirovan ku li gelek bajarên mîna Bosna û Hersk, Argantina, Columbia, Krwatia, Andonisia, Serbia û DYAyê hatine bikaranîn di ber çavan re derbas kir. vê pelê ev pîvan tev li ber çavan derbas kirin û analîze kirin û hin elementên hevbeş nemaze yên girêdayî rewşa Sûrîyayê bijartin.

pîvanên di vê pelê de bêhtir bi hûrgilî mijar girtine dest û vê pelê ev pîvan berhev kirine û bi awayekî zelal şîrove kirine, ji ber ku armanca wê ya sereke alîkarîya rêxistinên Sûrîyayî ye di pêvajoya bijartina doz û tawanên ku rêxisrin dixwazin Mîkanîzma Navdewletî ya Bêalî û Serbixwe li ser wan were pêkanîn. Ji alîyekî din ve vê kaxezê xwe spartiye hin jêderên din ku navên wan li vir hatiye diyarkirin.

---

1- Sûrîya ne beşekî sîstema Roma ya sereke ye, peymana damezrêner a dadgeha tawanên navdewletî. eger hikûmeta Sûrîyayê tev li vê peymanê nebe an bi rêya daxuyanîyekê pejirandina xebatên dadgehê ranegihîne, dê pêdivîya dadgehê her û her bi veguhestina dosyaya Sûrîyayî bo wê ji hêla Encumena Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî hebe.

## Sê: Destnîşankirina pîvanên bijartina dozên cengê yên ku ji hêla dadgehên navdewletî yên cûrbecûr ve hatin bikaranên û xwespartin bo wan pêkan e dema destnîşankirina dozên girêdayê Mîkanîzma Navdewletî ya Bêalî û Serbixwe di çêkirina dosya û peytên tawanên li Komara Erebî ya Sûrîyayî hatine kirine de.

Dadgehên Navdewletî yên cûrbecûr xwe spartine pîvanên cihêreng bo bijartina dozên ku tawanler li ser wan hatine cezakirin. em dikarin bibêjin ku di prensîpên sereke hebûn dadgehên navdewletî xwe spartin wan dema danîna pîvanên bijartina dozên tawanên cengê:

metirsî û mezinbûna tawanên tawanan û asta berpirsyarîtîya kesê armanckirî ji dozê. di rêbazên qonaxa bijartiina dozan û destpêkirina bi lêpirsînan heye.

**rêbaza yekem balê dikişîne ser tawanê (lêpirsînên ku ji bo tawanê tên kirin):** di vê rewşê de, bijartina bûyeran li gor pîvanên li jêr hêmana sereke ya gerandina lêpirsînê ye û bijrtina tawanbaran di qonaxa din de ye.

**rêbaza duyem balê dikişîne ser gumanbaran (lêpirsîna ku gumanbar bi rê ve dibin):** di vê rewşê de, bijartina tawanbaran ji pêşî ve li gor pîvanên li jêrê ye û ev bijartin çarenûsa lêpirsînê diyar dike.[2]

li vir divabe em diyar bikin ku lêpirsînên ji hêla gumanbaran ve tên birêvebirin belav in li vir divabe em diyar bikin ku lêpirsînên ji hêla gumanbaran ve tên birêvebirin belav in û desthilata lêpirsînan vî rêbazî dide pêş ji ber ku lezgîntir û hêsantir e. bijardeya meşandina rêbaza girêdayî gumanbaran di dema peydabûna peyt p agahîyan de rewa ye ku sedema bijartina vî rêbazî jî di qonaxa lêpirsînan a pêşîn de diyar dike (weke mînak ev rêbaz di doza Adolf Eichmann de hate bikaranîn) lê metirsîyeke vî rêbazî heye ku dîmena mezin ji ber çavan diçe an "alîgirtin' ' derdikeve holê, yan jî berhevkirin û şîrovekirina peytan bo teqezkirina gumanekê (di vê rewşê de pirsgirêk ew e ku tawanbarê bijartî berî bidawîbûna lêpirsînan û destpêka dadgehkirinê gunehkar e). teqez e ku alîgirî pirsgirêkeke navdar e di lêpirsînên ku li ser vê şopê dimeşin de û dibe ku bandora wê li ser encaman hebe, ku li gor nerîna hin dadweran ziyandar e. li gor tecrubeyê diyar dibe ku şêwazê herî baş bo destdanîna ser metirsîyên lêpirsînên ji hêla gumanbaran ve tên birêvebirin, ev in:

**1-** girtina hin alîyên din ên lêpirsînan li ber çav paşê vekirina rê bo analîzekirina rewşa giştî û ne tenê analîzekirina rewşa gumanbar.

**2-** balkişanndina ser heykelên rêxistinîku dikare di nirxandina rola gumanbar de bi bêalîtî alîkar be.

**3-** lêvegereke hundirîn bo encaman ji hêla tîmeke serbixwe ji berpirsên ku di lêpirsînan de ne beşdar bûn, di encamê de ev kes pirsgirêka alîgirtinê cem wan tuneye.[3]

di vî beşê kaxezê de em ê elementên xwespartinê di rewşa bijartina rêbazekî ji yên jor de diyar bikin:

---

2 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 233.
3 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 233.

**A)** elementên destnîşankirina metirsîa tawanê ( di rewşa lêpirsînên xwe dispêrin tawanê).

**B)** elementên girêdayî kesê gumanbar (tometbar) û asta berpirsyarîtîya wî (di lêpirsînên ku gumanbar wan bi rê ve dibe). li gel zelalkirina elementên din dema bijartina û destnîşankirina pêşikîya dozvekirinan.

**C)** elementên girêdayî qurbanî û şahidan.

**D)** mijarên siyaseta giştî.

**E)** mijarên pratîk.

**Têbînî:** beşê çarem ê vê kaxezê dê van elemntan şirove bike û dê li gor rêza li jêrê werin nîşandan.

| A) elementên destnîşankirina metirsîya tawanê | |
|---|---|
| 1 | hejmara qurbanîyên yekser û ne yekser |
| 2 | belavbûna xaknîgarî û wexyî ya tawanê |
| 3 | keysbazî û lawazkirina qurbanîyan |
| 4 | tundî/ hovîtî |
| 5 | cudakirina dijî grûpeke taybet |
| 6 | egera girêdana bi tawanin din |
| 7 | sitemkarî |
| 8 | ziyana civakî, aborî û ekolojî ku gihaye van civakan ji ber cengê |
| 9 | bandora ser asteke berfireh an demdirêj a van tawanan. |

| B) Elementên girêdayî kesayeta gumanbar (tawanbar) û asta berbirsyarîtîya wî | |
|---|---|
| 10 | xwezaya tawana ku kiriye |
| 11 | dûbarekirina tawanê |

| B) Elementên girêdayî kesayeta gumanbar (tawanbar) û asta berbirsyarîtîya wî | |
|---|---|
| 12 | asta beşdarîya wî ya yekser di tawanê de û daxwazên wî |
| 13 | egera ku sedemên wî girêdayî cûdakirinê bin |
| 14 | bikaranîna şaş ji bo desthilatê an karê fermî ji hêla tawanbar ve |
| 15 | posta tawanbarê birêveber li ser asta navxweyî, herêmî an niştîmanî |
| 16 | desthilatdarî û çavdêrîya ku tawanbar bi kar anîy û rola wî di biryarê girêdayî siyaset û stratîcîyê de. |
| 17 | asta zanîna tawanbar bi tawanên şopînerên wî |
| 18 | asta egera girtina tawanbar |
| 19 | asta peydabûna peytan / şahidên dijî tawanbar |
| 20 | nebersivdayîna tawanbar bo agahdarîyeke destnîşankirî |
| 21 | nepaqijîya navûdengê tawanbar/ nemaze kirina tawanên kirêt |
| 22 | gotinên wî / dibe ku berê me bidin peytên girêdayî tawanine din |

hin alîyên din ên giring hene ku dadgehên navdewletî xwe spartine wann bo danîna pîvanên bijartina dozên tawanên cengê

**1-** elementên girêdayî qurbanî û şahidan.
**2-** mijarên siyaseta giştî.
**3-** mijarên pratîk.

| C) elementên girêdayî qurbanî û şahidan | |
|---|---|
| 23 | asta peydabûna qurbanî/ şahidan. |
| 24 | asta amadebûna qurbanîyan bo axaftinê |
| 25 | asta rastîya şahidan û bawerîya bi wan |
| 26 | metirsîyên li ser qurbanî/ şahidan hene |
| 27 | egera vegerandina mafan |
| 28 | Tasta peydabûna programên parastina şahidan û çalakbûna wan |

| D) Mijarên Siyaseta Giştî | |
|---|---|
| 29 | Çalakkirina Feqîtîya Qanûna Navdewletî |
| 30 | bijartina tawanên ku neketine dadgehan û bal nehatiye kişandin ser wan |
| 31 | bijartina tawanên ku nûnertîya hemû grûpên navxweyî yên ziyanxwer dikin |
| 32 | asta amadebûna dadgehên niştîmanî û karîna wê ser darizandina tawankeran |
| 33 | nirxê sembolî yê dozvekirinê |
| 34 | nerîna giştî der barê çalakîya dadgehê û bandora wê |

| E) Mijarên Pratîk | |
|---|---|
| 35 | jêderên lêpirsînan ên berdest |
| 36 | bandora lêpirsîna nû li yên heyî û li çêkirina lîsteyên tometbarkirinê |
| 37 | dema pêşbînîkirî bo bidawîkirina lêpirsînan |
| 38 | dema lêpirsînan |
| 39 | asta têkûzîya peytan |
| 40 | peydabûna peytên ku tometbar bêguneh dike |
| 41 | astengîyên qanûnî |
| 42 | heta çi astê serkeftina lêpirsîna/dozvekirina di vê dozê de armancên stratîcîk yên mîkanîzmê diçespîne |
| 43 | heta çi astê doz girêdayî tîpê lêpirsîn û dadgehkirinên heyî û yên pêşerojê |

## şirovekirina piştîneya van pîvanan û diyarkirina dadgehên navdewletî yên ku xwe spartine wan di pêvajoya bijartina dozan û destnîşankirina pêşikîyên dozvekirinan der barê tawanên navdewletî de.

li jêrê em ê pîvanan bi berfirehî şirove bikin li gel destnîşankirinan dadgehên navdewletî yên cûrbecûr yên ku xwe spartine wan:

## A) elementên diyarkirina metirsî û mezinbûna tawanan elementên diyarkirina metirsî û mezinbûna tawanan

**1- hejmara qurbanîyên yekser û neyekser:** hejmara qurbanîyan di destnîşankirina asta metirsîya tawanan de alîkar e û ji hêla hemû dadgehên navdewletî ve tê bikaranîn, dadwerên dadgehên Neteweyên Yekbpyî her dema balê dikişînin ser vê elementê dema ku metirsîya tawanê nîşan didin (bi taybetî dema ku cezayan derdixin). pêwîstîya bidestxistina hejmarên rast bi hejmareke mezin a qurbanîyan di warê cengê an tundîya bi komî de heye û gelek caran ev hejmarên pêşbînîkirî bi nakok in li dadgehan û bo raya giştî jî. du rêbazên sereke yên çarçovekirina hejmara qurbanîyan hene: jimartina hemû qurbanîyên ku navên wan hatine eşkerekirin an hewldana çarçovekirina wan bi rêya peytan.
dadweran her du rêbaz pejirandin û encamên herî baş bi rêya her du rêbazan bi hev re ne.[4]

**2- dem û cihê tawanên:** dema tawanên diyar dike gelo gelek tawan di demekê kurt de hatine kirin an hinek tawan di demeke dirêj de. cih jî alîkarîya niirxandina herêma destnîşankirî dike ya ku bandora tawanên navdewletî lê hebû. di heman demê de di nirxandina bandora dmdirêj a van tawanan de ku carcaran qurbanîyan û ziyanên yekser derbas dike alîkar e û di encamê de bijartina dozan hêsan dike. dibe ku teknîkên çêkirina nexşeyên tawanên di destnîşankirina herêmên germ an yên ku asta tawanan li wan bilind de ye alîkar bin. weke mînak analîzeyên bi vî rengî hatin çêkirin ji hêla ofîsa dozgerê giştî yê dadgeha tawanên navdewletî di qonaxeke pêşwext a lêpirsînên Darforê de û wke pêvekê hate pêşkêşkirin bo daxwaza derxistina fermanên girtinê di doza Darforê ya duyem de, her weha di pêwendîyên giştî de jî sala 2008an hate bikaranîn.[5] li gor gotinên dozgerê giştî yê dadgeha tawanên navdewletî ya Rawendayê, ofîsa wî pîvana belvbûna xaknîgarî di dema bijartina û dayîna pêşikîyê bo dozan de bi kar anî, dozgerê giştî yê dadgeha tawanên navdewletî ya rawendayê got ku pîvana belavbûna xaknîgarî xist nav pîvanênbijartin û dayîna pêşikîyê yên bikarhatî ji ber ku giring e û alîkar e di warê dûrketina ji alîgirtin û cudakirinê de her weha weke şêwazekî çesipandina asoyên lihevhatina niştimmanî li Rawendayê ye.[6]

**3- lawazkirina qurbanîyan:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo tawanên ku sûd ji lawazîya qurbanîyan girtin û rewşa wan a lawaz weke derfet dît.[7] ev pîvan li ser tawanên li dijî zarok, jin û grûpên niştecihên resen tê pêanîn , tawanên kuştin, destdirêjî û yên din ên zayendî li xwe digire li gel tawanên ku li dijî zarokan hatine kirin an ferzkirina mercîên jîyînê li ser grûpeke (olî, etenîk… hwd) a destnîşankirî bi armanca wêrankirina wê . dibe ku xwezaya tawanên ku di pêşikîyê de bin li gor rewşa her şerekî çekdarî were destnîşankirin bi rêya bikaranîna vê pîvanê. weke nimûne eger stratîcîya dozgerê giştî yê dadgeha tawanên navdewletî ya rawendayê balkişandina ser dadgegkirina kesên ku tawanên qirkirinê kiribin û destdirêjî û tundîya zayendî weke alaveke qirkirinê hatibin bikaranîn, wê demê pêşikî ji tawanên zayendî re ye.

---

4 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page211.
5 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 215
6 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 59
7 https://www.icc-cpi.int/iccdocs/pids/legal-texts/rulesprocedureevidenceeng.pdf

**4- Tundî/ hovîtî:** bijartina an dayîna pêşekîyê bo tawanên ku bûn sedema êşeke ne hewce ji bo qurbanîyan[8] weke nimûne dibe ku destdirêjî[9] û îşkencekirin[10] di nav van tawanan de bin. ji alîyekî din ve qanûna navdewletî ya mirovî ya girêdayî bikaranîna alavên cengê û şêwazên wê ku dibe sedema "êşeke ne hewce' ' beşekî qanûna navdewletî ya mirovî ye ku di hemû şerên çekdarî de tê bikaranîn.[11] weke nimûne dibe ku pêşekî ji tawanên ku çekên kîmawî di wan de hatibe bikaranîn re be ku bûn sedema êşekê ne hewce ji bo qurbanîyan.

**5- cûdakirina li dijî grûpeke destnîşankirî:** bijartina an dayîna pêşekîyê bo tawanên ku ziyan gihandine grûpeke nijadî, etenîk, niştîmanî, olî an siyasî ya destnîşankirî. giringa asta tawanên dijî grûpeke destnîşankiî a niştecihan li ber çavan were girtin.[12] eger ev tawan gihan asta paqijkirina nijadî[13] an qirkirinê[14] wê demê metirsîya tawanê mezintir dibe. tawan qirkirinê ya herî xirab e û cudahîya di nav wê û paqijkirina nijadî de ew e ku paqijkirina nijadî ji qirkirinê bêhtir girêdayî xaknîgarîyê ye û dûrkirina grûpên nijadî yan yên armanckirî ji herêmekê destnîşankirî.[15]

**6- egera girêdana bi tawanine din:** bijartina an dayîna pêşekîyê bo tawanên ku egera girêdana wan bi tawanine din hebin an yên ku di lêpirsînê de peytên nû girêdayî dozvekirina li tawaneke navdewletî ya din eşkere bikin.

**7- setemkarî:** bijartina an dayîna pêşekîyê bo tawanên ku xebateke taybet an kînên (demdirêj an pêşketî) hatine erkdarkirin bo bicihanîna wan ev yek jî nîşana hovîtîyekê ji rengekî taybet e.[16] mînaka wê ya herî berçav tawana qirkirinê ye.

**8) ziyana civakî, aborî û ekolojîk ya ku gihaye civakan ji ber van tawaanan: 8) ziyana civakî, aborî û ekolojîk ya ku gihaye civakan ji ber van tawaanan:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo tawanên bûn sedema wêrankirina ekolojîyê an bikaranîna jêderên xwezayî bi

---

8 https://www.icc-cpi.int/iccdocs/pids/legal-texts/rulesprocedureevidenceeng.pdf & https://www.icc-cpi.int/iccdocs/otp/29.02.16_Draft_Policy-Paper-on-Case-Selection-and-Prioritisation_ENG.pdf page 13

9 time.com/4377708/congo-bemba-rape-war-crimes-icc/

10 https://www.theguardian.com/law/2016/nov/15/us-army-and-cia-may-be-guilty-of-war-crimes-afghanistan-says-icc

11 Rule 70, ICRC Customary IHL database, https://ihl-databases.icrc.org/customary-ihl/eng/docs/v1_rul_rule70

12 www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 115

13 The term "ethnic cleansing" has been used in several Security Council and the General Assembly resolution on the conflict in Bosnia and Herzegovina, and has been recognized in the judgments and indictments of the International Criminal Tribunal for the Former Yugoslavia and the International Court of Justice. An interim report prepared by the UN Committee of Experts defined ethnic cleansing as "making a region ethnically homogeneous by using force or intimidation to remove people from certain groups from that region." The Commission defined ethnic cleansing as "a systematic policy developed by a specific ethnic or religious group aimed at removing the civilian population from another ethnic or religious group from certain geographic areas through violence and terrorism." This term has not been recognized as a separate crime in international law itself, but processes similar to those described in the term "ethnic cleansing" may amount to war crimes, crimes against humanity or genocide.

14 lihevkirina qedexekirina qirkirinê û sezakirina girêdayî wê https://www.icrc.org/ara/resources/documents/misc/62s-grn.htm

15 www.oxfordhandbooks.com/view/10.1093/oxfordhb/9780199232116.001.0001/oxford-hb-9780199232116-e-3

16 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 217

awayekî ne rewa an wêêrankirina mîrateyên çandî. nimûne doza Ehmed Elfeqî Elmehdî li pêş dadgeha tawanên navdewletî ku dadgehê ew bi wêrankirina gorên Tembko li Malîyê gunehbar kir û 9 salên zindankirinê lê birîn.

**9-Bandora demdirêj a tawanan:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo tawanê demdirêj û xwedî bandoreke fireh û dibe qurbanî û ziyana yekser derbas bike. (mîna tundîya li dijî hêzên parastina aştîyê, bombe, şokên demdirêj, ziyanên aborî, ziyanên ekolojîk)[17] dibe ku ev element tawanên demdirêj jî li xwe bigire li ser dirêjahîya çend salan hatibin kirin mîna îşkencekrin û windakirina bi neçarî

## B) elementên girêdayî kesê gumanbar (tawanbar) û asta berpirsyarîtîya wî:

**10- xwezaya tawanên ku tawanbar kirine:**[18] bijartina an dayîna pêşekîyê bo tawanên ku tometbar tawaneke metirsîdar li dû xwe hiştiye. xwezaya tawanan nîşana elementên rastîn in bo her tawanekê mîna bûyîna kuştin û destdirêjîyê û tawanên zayendî yên din, tawanên ku li dijî zarokann hatine kirin an ferzkirina hin mercan li ser jîyana grupeke (nijadî, olî ...hwd) bi armanca wêrankirina wê. her ku metirsîya tawanê mezintir be, gerekdarî bi balkişanidna ser dozê bêhtir heye.

**11- dûbarekirina tawanê:** bijartina na dayîna pêşekîyê bo tawanên ku tometbar dixwaze wan dûbare bike an dema ku bi kirina tawaneke pêwendîdar hatine gunehbarkirin.[19]

**12- asta beşdarîya tometbar di tawanê de û daxwazên wî:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo dozên ku tometbar bi awayekî yekser di wan de beşdar bû her weha bi mebest û zanebûn kiribe (em di vî warî de dikarin xwe bispêrin benda 30 ji sîstema Romayê ya sereke)

**13- egera ku sedemên tometbar girêdayî cudakirinê bin:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo dozên ku sedemên kirinê ji hêla tometbar ve cudakirina nijadî, niştîmanî, siyasî, olî, zayendî, civakî, aborî an çi cûreyekî cudakirinê be ku ziyanê digihîne nirxên pirrengî, wekhevî û tevjîyanê.[20]

**14- bikaranîna şaş bo hêzê an posta fermî:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo dozên ku berpirsên dewletê an alîyên çalak yên din bawerîya civaka niştimanî an navdewletî bi xwe dişkînin û cihê karê xwe dikin derfet bo kirina tawanan.[21] dadwerên navdewletî gelek caran ev yek şirove kirine û posta tometbar bi asta berpirsyarîtîya wî di ber tawanê de girêdane.[22]

17 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 217
18 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32
19 https://www.icc-cpi.int/iccdocs/pids/legal-texts/rulesprocedureevidenceeng.pdf
20 https://www.icc-cpi.int/iccdocs/pids/legal-texts/rulesprocedureevidenceeng.pdf
21 https://www.icc-cpi.int/iccdocs/pids/legal-texts/rulesprocedureevidenceeng.pdf
22 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 216

**15- posta tawanbarê birêveber li ser asta navxweyî, herêmî an niştîmanî:** gerek e pîvana bijartin û dayîna pêşekîyê li ber çavan were girtin di dozên ku tawanbar di wan de xwedî asteke birêveber be li ser asta navxweyî, niştîmanî an herêmî.nimûne encumena ewlekarîyê biryar da ku "divabe dadgehan tawanên navdewletî li Yugoslavia balê bikişîne ser darizandina birêveberên leşkerî û sivîl yên ku egera berpirsyarîtîya wan di ber binpêkirinên qanûna navdewletî ya mirovî de heye ku ji sala 1991ê ve li herêma Yugoslaviaya berê çêbûne, ne tenê balê bikişîne ser alîyên çalak ên asa' [23] her weha biryara girêdayî çêkirina birêveberîyên awarte li Kembodyayê (dadgeha elxemîr elhumur) diyar kir ku her birêveberîyek karekî wê heye[24] li ser serkirdeyên kembodyaya demokratîk û berpirsên di ber tawanên di nav her du salên 1975 û 1979an de bo pîvanên destnîşankirina pêşikîyan û dozên tawanên navdewletî yên sereke.

**16- Desthilatdarî û çavdêrîya ku tometbar bi kar anî û rola wî di biryarên girêdayî siyast û stratîcîyan de:** piranîya dadgehên tawanên navdewletî nîşan da ku karê wê dozvekirina li serkirdeyên mezin e yên di ber tawanan de berpirsyarîtîya wan a herî mezin e. divabe rola tawanbar di biryarên girêdayî siyaset û stratîcîyên ku bûn sedema tawanan li ber çava be dema bijartin û dayîna pêşekîyê bo dozan. ne hewce ye ku tawanbar bi xwe pilan danîbin an siyaseta giştî çêkiribe lê bese ku hêz di destê wî de bû ji ber karê wî yê pêwendîdar.[25]

**17- asta zanîna tawanbar bi tawanên şopînerên wî:[26]** bijartin an dayîna pêşekîyê bo dozên ku tawanbar di wan de kiryarên şopînerê xwe nas dike (di vî warî de xwespartin bo benda 30î ji sîstema Romayê ya Sereke û benda 153yan ya girêdayî berpirsyarîtîya birêveberîyê di qedexekirina van tawanan de)

**18- Asta egera girtina tawanbar:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo dozên ku egera girtina tawanbar di wan de bilind e, di hin dozan de egera girtinê gelekî nizm e ji ber gelek sedeman.[27] nimûne pirsgirêka herî mezin ya ku dadgeha tawanên navdewletî rastî wê tê ew e girtina tawanbaran.[28] dadgeh xwe dispêre alîkarîya dewletan pê re û ev pirsgirêk gelek caran derdikeve ji ber ku alîyekî dadgehên navdewletî yê cîbicîkar tuneye ku tawanbaran bigire.

**19- asta peydabûna peytan/ şahidan li dijî tawanbar:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo dozên ku peyt li dijî tawanbar tê de peyda ne û gelek şahid amade ne li dijî wî biaxivin.[29]

**20- neguhdana tawanbar bi agahdarîyeke detnîşankirî:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo rewşên ku tawanbar guhdan bi agahdarîyeke destnîşankirî nekiriye ku tawanekê neke bi taybetî piştî ku bi ziyanên vê tawanên agahdar bûye.[30]

---

23 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 38
24 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 28
25 https://bit.ly/2GWUCvm, page 11
26 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 94
27 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 31& 32&33
28 https://reliefweb.int/sites/reliefweb.int/files/resources/603D8E48589F6DD1C12577E70039FB54-Aegis_Jan2009.pdf, page 3.
30 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 217

**21- xirabîya navê tawanbar/ kirina tawanekê kirêt:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo tawanên ku navûdengê tawanbar tê de xirab e. nimûne tevî ku Dadgeha Tawanên Navdewletî ya Yugoslaviayê[31] bal kişand ser darizandina birêveberên mezin yên ku guman heye ew di ber tawanan de berpirs in lê karê dozgerê giştî yê dadgeha tawanên navdewletî li Yugoslaviayê diyar dike ku hin tawanbarên (berpirsyarîtîya wan kêmtir e) hatine şopandin ji ber gelek sedeman ji nav wwan xirabîya navûdengê wan ji ber ku tawanên kirêt kirine nemaze li herêmênn ku gelek tawamêm metirsîdae li wan çêbûne weke doza (Jelisić in Brčko )[32]

**22- gotinên tawanbar/ dibe ku berê dozê bidin peytên girêdayî tawanine din:** bijartina an dayîna pêşekîyê bo dozên ku dibe gotinên tawanbar peytên tawaneke din eşkere bikin..[33]

## C) elemntên girêdayî qurbanî û şahidan

**23- asta peydabûna qurbanî/ şahidan:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo dozên ku şahidên rastbêj û amade bo axaftinê tê de peyda ne li xala 24 û 25an binêre.

**24- asta amadebûna qurbanîyan bo axaftinê:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo dozên ku hejmareke baş ji şahidan jê re heye û karibin biaxivin. her çendî şahid baş be lê nikaribe gotinên xwe bibêje ev yek hêza dozgerîyê lawaz dike. eger du an bêhtirî du şahidan hebin û naxwazin gotinên xwe bibêjin wê çaxê divabe dozgerîya giştî ji nû ve stratîcîya xwe binerxîne.[34]

**25- asta rastîya û bawerîya bi şahidan:** bijartina na dayîna pêşekîyê bo dozên ku şahid tê de xwedî rastî û bawerî bi wan heye. divabe rastîya her şahidekî li ber çavan were girtin. dibe ku şahidê xwedî bawerî ne xwesî rastî be û dibe ku hevkar be, kujer be an bûjenên hişbir dikişîne ev jî dibe sedema ferzkirina hin bendan eger li ser tawanê jî hazir bû. eger hebûna vî şahidî gelekî giring be, divabe hin şahid gotinên vî şahidî piştrast bikin.[35] û divabe mijarên dijatîya bervanîyê bo gotinên şahid li ber çavan werin girtin. di vê çarçoveyê de divabe were zanîn gelo tu pirgirêkên şahid hene ku bandorê li axaftina wî dikin. eger şahid bibêje ew li ser bûyerê hazir bû divabe dûrbûna di nav wî û tawanbar de were destnîşankirin, dem, dîtin û gelek elemntên din ên pêwendîdarên tawanê werin şirovekirin.[36] her weha divabe were zanîn berjewendîyên şahid û tawanbar digihên hev li gel zanîna gelo şahid axaftinên xwe guhertine an na her weha cudahîya axaftina şahidên ku gotinên xwe der barê tawanekê de didin ku tawanbar îdîa dike kengî û li ku derê kiriye.[37]

---

31 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 39
32 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 226
33 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 53
34 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 53
35 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 53
36 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 54
37 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 54

**26- egera metirsîyên li ser qurbanî/ şahidan:** di hizêrana sala 200î de (Claude Jorda) serokê dadgeha tawanên navdewletî ya Yugoslaviaya berê raporek pêşkêşî encumena ewlekarîyê kir tê de behsa egera balkişandina dadgeha tawanên navdewletî ya Yugoslaviaya berê ser tawankerên pilebilind tenê kir, ku kesên pilenizm li pêş dadgehên niştîmanî werin dadgehkirin. raporê diyar kir ku dadwer vê pêşniyarê di vê qonaxê de napejirînin ji ber rewşa siyasî li dewletên pêwendîdar û dozên ewlehîya şahid û qurbanîyan[38].. ev yek dide xuyakirin ku bijartin û dayîna pêşekîyê bo dozan divabe metirsîyên li ser qurbanî û şahidan di ber çavan re derbas bike

**27- egera vegerandina mafên qurbanîyan an malbatên wan:** bijartin an dayîna pêşekîyê bo dozên ku egera vegerandina mafên qurbanîyan di wan de pêkan e çi di warê madî an derûnî de be ji ber ku ev yek di qonaxa dadmendîya veguhêz de gelekî giring e û dibe ku şêwazekî baş ê çesipandina asoyên lihevkirina niştîmanî li Sûrîyayê be. (Doza Katanga:[39] birêveberîya dadgeha tawanên navdewletî bo cara pêşîn di dîroka wê de bedêl dan qurbanîyên tawanên ku German Katanga bi cih anîbûn)..

**28- asta peydabûna sîstem û programên parastina şahidan:** divabe sîstem û programên parastina şahidan ên peyda di dema bijartina dozê de berçav bin her weha egera qayilkirina şahidên sereke ên ku naxwazin an nikarin gotinên xwe ji ber sedemên ewlehî, kesane an sedemên din bibêjin ku beşdarî programên parastina şahidan bibin. danûstendinên dozgerê giştî bi wan re dê bandorê bigihîne biryarên destpêkirina dadgehkirinê.[40]

## D) Mijarên Siyaseta Giştî

**29- çalakkirina feqîtîya qanûna navdewletî:[41]** bijartin an dayîna pêşikîyê bo tawanên ku di şirovekirina qanûna tawanên navdewletî yên heyî de alîkar in û rêgezên heyî lli gel zelalkirina çarçoveya parastina heyî diçesipîne.[42]

**30- bijartina tawanên ku berê bal nehatiye kişandin ser wan:[43]** bijartin an dayîna pêşekîyê bo tawanên ku bal nehatiye kişandin ser wan berê. giringîya vê elementê ew e ku alîkarîya çalakkirina feqîtîya qanûna navdewletî û bipêşxistina têgînên qanûna tawanên navdewletî. nimûne doza Bêmba li dadgeha tawanên navdewletî giring bû ji ber yekemîn tawanbarîyeke tawana destdirêjîyê di dadgeha tawanên navdewletî de û di bipêşxistina tawana destdirêjîyê weke tawaneke cengê di qanûna navdewletî ya mirovî de. her weha doza (Ehmed Elfeqî

38 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 36
39 https://www.icc-cpi.int/legalAidConsultations?name=pr1288
40 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 53
41 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32
42 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32
43 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32

Elmehdî) li pêş dadgeha tawanên navdewletî giring bû ji ber ku yemen doz a tawana wêrankirina mîrateyê çandî ye û dadgehê ew gunehbar dît ji ber ku di wêrankirina mîrateyê çandî de li Malîyê beşdar bû. 29) çalakkirina feqîtîya qanûna navdewletî : bijartin an dayîna pêşikîyê bo tawanên ku di şirovekirina qanûna tawanên navdewletî yên heyî de alîkar in û rêgezên heyî lli gel zelalkirina çarçoveya parastina heyî diçesipîne. .

**31- bijartina tawanên ku nûnertîya grûp û civakên navxweyî yên ziyanxwir ji ber tawanan dike:** bijartina tawanên ku ne tenê nûnertîya beşekî tawanên sereke dike lê hemû grûp û civakên navxweyî yên ku ziyan ji ber tawanan xwarine.[44]

**32- asta amadebûna dadgehên niştîmanî û derfeta dadgehkirina tawankeran:**[45] bijartina na dayîna pêşekîyê bo dozên ku dadgehên niştîmanî dikarin dozan li tawanbaran vekin di dema nuha de. dibe ku dadgehên niştîmanî karibin hin tawankeran darizînin heta ku encumena ewlekarîyê doza Sûrîyayî veguhêze Dadgeha tawanên navdewletî.

**33- nirxê sembolî an bandora dozvekirinê:** giring e ku di dema bijartin û dayîna pêşekîyê guhdan bi dozên nirxên sembolî bibe. li gel ku gelek caran dozgerên giştî xwe dispêrin bandora vegerok a dozvekirinê, û dadwerên qanûna tawanên navdewletî wê li ber çavan digirin di dema darizandinê de.[46] dibe ku bandora qedexekirinê dozvekirinê li ser van beşan dabeş bikin: qedexekirina giştî, ya nîşankirî û ya armancker û ya sînorkirî. qedexekirina giştî tawanan bi rêya tirsandina ji sezayê disekinîne, ya destnîşankirî çalakîyên kesên hatine darizandin di pêşerojê de disekinîne. ya armanckirî hin kesan an grûpên civakê disekinîne û ya sînorkirî tawanan kêm dike (dema ku tawanker tawanê nake ji tirsa sezayê).[47]

**34) nerîna giştî der barê bêalîtî/ hevsengîya mîkanîzmê:**[48] divabe pîvan bandora li civakê li ber çavan derbas bike, an heta çi astê mîkanîzm pêdivîyên qurbanîyan bi cih tînin.[49] mînak xebatên ku berpirsan li Sîralyon kirine nimûneyeke şirovekirina têgînên qanûnî yên girêkdar e bo civakên ziyanxwer. ofîsa dozgerê giştî li dadgeha taybet li gel hin berpirsên din gelek xebat di destpêka serwerîya dadgehê de kirin ji bo şopandina tawanbarên berpirs û çawanîya bandorkirina vê yekê li bijartina tawankeran. bê guman şirovekirina vê yekê li gund û bajarên Sîralyonê zehmet bû ku gelek qurbanî nêzî tawankeran dijîn.[50]

---

44 https://www.icc-cpi.int/itemsDocuments/20160915_OTP-Policy_Case-Selection_Eng.pdf , page 15

45 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32

46 http://repository.law.umich.edu/cgi/viewcontent.cgi?article=1030&context=mjil, page 307.

47 https://www.nurembergacademy.org/fileadmin/media/pdf/publications/DETERRENCEPUBLICATION.pdf , page 2

48 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32

49 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 199

50 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 269

## E) Mijarên pratîk

**35- jêderên lêpirsînê yên berdest:**[51] danîna jêderên madî yên berdest bo lêpirsînan ber çavan di dema bijartina dozan de li gel zehmetîyên pratîk yên ku dê rastî mîkanîzmê bên di pêvajoya lêpirsînan.

**36- bandora lêpirsînên nû li ser lêpirsînên heyî û çêkirina lîsteyên tawanbarîyê:**[52] dayîna pêşekîyê bo dozên ku egera naskirina peytên nû yên dozên din di pêvajoya wê de hene an lêpirsîna tê de hin navan li lîsteya tawanbarîyê zêde bike.
37) dema pêşbînîkirî bo bidawîkirina lêpirsînan: dibe ku pêşekî ji dozên ku lêpirsînên wan demkurt in û encam bilez diyar dibin. an dibe ku pêşekî ji dozên demdirêj re be da ku serwerîya mîkanîzmê di pêvajoê de berdewam be an da ku peytên nû girêdayî dozeke din di nav re diyar bibin.

**37- dema pêşbînîkirî bo bidawîkirina lêpirsînan:**[53] dibe ku pêşekî ji dozên ku lêpirsînên wan demkurt in û encam bilez diyar dibin. an dibe ku pêşekî ji dozên demdirêj re be da ku serwerîya mîkanîzmê di pêvajoê de berdewam be an da ku peytên nû girêdayî dozeke din di nav re diyar bibin.

**38- dema lêpirsînan:**[54] weke nimûne divabe di dema dayîna pêşekîyê de lêpirsînên pêşerojê li ber çavan bin her weha asta guncîna dema lêpirsînan ku ew ê baştir be lêpirsîn di dozê çêbibe piştî demekê ji ber metirsîyên li ser çahidan an destpêka demlidest ji bo parastina peytan.

**39- asta têkûzîya peytan:**[55] di dema pêşkêşkirina peytan divabe çawanîya bidestxistina peytan berçav be her weha gelo dadgeh dê karibe ji ber hin sedeman peytan dûr bixe. eger peyt werin bidûrxistin divabe bandora wan li ser biryarê were zanîn.[56] her weha divabe cûreyên peytên gunehbarkirinê an bêgunehîyê werin diyarkirin.

**40- peydabûna agahî û peytên ku tometbar bêguneh dikin:**[57] divabe asta peydabûna agahî û peytên ku tawanbar bêguneh dikin ber çavan werin girtin her weha çi faktorên din ên dibe ku bandorê li tawanbarîyê bike.[58]

---

51 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32
52 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32
53 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32
54 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32
55 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32
56 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 54
57 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32
58 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 55

**41- astengîyên qanûnî yên berçav:**[59] divabe astengîyên qanûnî yên dozan berçav bin, nimûne: peyt bi awayekî ne qanûnî hatibin bidestxistin an nikarîbûna desrbasbûna Sûrîyayê ji hêla mîkanîêzmê ji bo çêkirina lêpirsînan an peydakirina peytan an jî nikarîbûna bicihanîna pîvanên bijartinê ji hêla dadgehên niştîmanî yên cûrbecûr ve.

**42- heta çi asta serkeftina lêpirsînan/ dozvekirina di vê dpzê armancên stratîcîk ên mîkanîzmê bi cih tînin:**[60] armancên stratîcîk 248 girtingîyeke garantîkirina cezakirina di tawanên binpêkirina bo mîkanîzmê ne li gor biryarên komeleya giştî /71 ya qanûna navdewletî bi rêya lêpirsîn û dadgehkirinên serbixwe li ser asta navxweyî an navdewletî. li gel garantîkirina wekhevîyê bo hemû qurbanîyan di qedexekirina bûyîna binpêkirinan di pêşerojê de bo pêkanîna aştîyeke domdar li Sûrîyayê. divabe ev armanc berçav bin di pêvajoya bijartina dozan û destnîşankirina pêşikîya dozvekirinan de û çesipandina dozên bijartî bo armancên stratîcîk bikeve gengeşeyê de.

**43- heta çi astê doz bi tîpên belav ên lêpirsîn û dadgehkirinên heyî û yên pêşerojê re hevseng in:**[61] divabe ev xal berçav be dema ku mîkanîzm dosyayên lêpirsînên cûrbecûr veke, wê çaxê tê diyarkirin gelo doza nû bi tîpê lêpirsîn û dadgehkirinên heyî û yên pêşerojê re yên mîkanîzmê hevseng e.

59 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32
60 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32
61 http://www.toaep.org/ps-pdf/4-bergsmo-second , page 32

## Paşgotin

li şûna ku her rêxistineke Sûrîyayî qewîtîyên xwe bi tenê pêşkêşî Mîkanîzma Navdewletî ya Bêalî û Serbixwe bike, ya baş ku hemû rêxistin bi hev re qewîtîyên komî bo doz û tawanên ku ev rêxistin dixwazin mikanîzma navdewletî balê bikişîne ser wan pêşkêş bikin dema berhevkirin, parastin û analîzekirina peytan û çêkirina dosyayan. pîvanên di vê pelê de weke lêvegerekê ne alîkarîya rêxistinên Sûrîyayî dikin bo diyarkirina sedemên bijartin û dayîna pêşekîyê bo hin dozan li gor bingeheke zelal a destnîşşankirî. li vir divabe were diyarkirin ku mijara bijartina dozan û rêzkirina wan ne zanist e bi xwe lê pêvajoyeke pîşe ye li gor hin pisporan ji ber ku xwe dispêre prensîpên nerm bo analîzekirina grûpeke bêsînor a sînaryoyên rastîn ku xwe bi xwe tên pêşkêşkirin. li şûna girtina her elementekê bi tenê, ya baş hemû rastî û element bi hev re berçav bin paşê dozên ku divabe Mîkanîzma Navdewletî ya Bêalî û Serbixwe balê bikişîne ser wan, werin destnîşankirin.

SCM

المركز السوري للإعلام وحرية التعبير

Navenda Sûriyeyî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê

Syrian Center for Media and Freedom of Expression